



HDP

# BULTENA ÇANDINIYÊ

## Hilberînerên Tûtinê, ji aliyê îktîdara AKP'ê ve tèn tasfiyekirin!


- Di sala 2017'an de di Qanûna Têkoşîna bi Qaçakvaniyê re guhertin çêbû. Li gorî vê guhertinê ji Tîrmeha 2021'an û şûnde hilberînerên ku belgeya wan a bazirganiyê tune be, nikarin hilberînê bikin. Yê hilberînê bikin jî dê bi 3-6 sal girtina hepsê bêne cezakirin.
- Hejmara hilberînerên tûtinê di 18 salên dawî de ji 405 hezar kesan daketine 57 hezaran.
- Di sala 2008'an de piştî TEKEL arizîkirin, li Tirkiyeyê ji sedî 90 kesên tûtinê dikişîne derbasî şirketên biyanî bûn. Li Tirkiyeyê nêzî 20 milyon kes tûtinê dikişîne.
- Di encama tasfiyekirina tûtinê de tenê di sala 2020'an de 562 milyon dolar îthata tûtinê kirine.
- Beriya AKP'ê di fabrîqeyên çigarê de kotaya kirîna tûtina xwecîhî ji sedî 50 bû. Di serdema AKP'ê de ev reqam daket asta ji sedî 11'an.
- Di sala 2002'an de bi "Qanûna Guhertina Der Barê Piyasa Berhemên Tûtin û Alkolê de", dewletê alîkarî û piştgiriya bi hilberîneran re qut kir. Ji bo krîna tûtinê kota danî. Hilberîna tûtinê bi destê şirketên navdewletî de berda.

Li gorî salan hejmara Hilberîner û Hilberîna tûtinê:

Sal	Hilberîn (ton)	Hêjmara hilberîneran
2002	159 hezar û 521	405 hezar û 882
2008	93 hezar û 403	181 hezar û 588
2011	53 hezar û 667	65 hezar û 152
2012	45 hezar û 613	50 hezar û 881
2013	73 hezar û 284	71 hezar û 26
2014	93 hezar û 158	87 hezar û 865
2015	73 hezar û 74	74 hezar û 695
2016	67 hezar û 989	62 hezar û 144
2017	74 hezar û 238	64 hezar û 464
2018	93 hezar û 665	64 hezar û 541
2019	75 hezar û 276	55 hezar û 871
2020	82 hezar û 791	57 hezar û 296

Çavkanî: TUİK

## Belgeya Erkê Nexşeya Hilberîna Tûtînê ya li Gorî Herêman



- Beyî peyman bê îmzekirin di hilberîna tûtînê de bi rêjeya ji sedî 87'ê Herêma Başûrê Rojhilat cih digire. Bi rêjeya ji sedî 13 jî Herêma Rojhilatê Anatoliya cih digire.
- Baca ku ji çigarê digirin, di sala 2010'an de derxistin rêjeya ji sedî 78,25'an. Di sala 2011'an de ev rêje derxistin ji sedî 84,25'an. Di pakêta çigarê de 20 heb cigare hene. 16'ê wan pereye bacê ye.

## Pakêta çigarê ya bi 16 TL tev bac e



## Di serdema AKP'ê de çandinî têk çûye!

- Li gor rapora Rêxistina Hevkarî û Pêşxistina Aboriyê (OECD) ya meha tîrmehê, li Tirkîyeyê piştgiriya çandiniyê di sala 2020'an de sedî 4 a Dahata Nesafîkirî ya Neteweyî (GSYH) pêk dianîn lê GSYH di sala 2018-2020'an de sedî 1,4 paşve çûye.
- Sektora çandiniyê di sala 2020'an ji GSYH'yê ji sedî 10,2 par digirt lê ev raqam di sala 2020'an de sedî 6,4 paşve çûye.
- Tirkîye di sala 2002'an de bi girtina para ji sedî 3,66 ya GSYH'yê, di nav welatên OECD'yê de di rêza yekemîn de cih digirt lê di sala 2020'an de bi sedî 1,61 re ket rêza 3'yemîn.

## Divê Hikûmet Deynê Welatîyên ku Deyndarên Şîrketên Ceyranê ne Bide!


- EPSAŞ Dîcle li Êlihê bi hinceta nedayîna deynan ava gundên Zilan, Bacaxê, Selîvê, Kanîkê, Malê Gir, Hiskut, Holê û Xoxê qut kir.
- Nifusa gundên ku ava wan hat qurtkirin nêzî 7 hezar in û bi giştî deynê wan 7 milyon TL ye. Dema ev rewş li ber çavan tê girtin serê mirovan nêzî 1000 TL dikeve. Ger bifikirin piranî deyn faîz in, divê faîz bîn jêbirin û deynê gundiyan ji aliyê dewletê ve bê dayîn.
- Li gorî TUİK'ê Endeksa Bihayên Dahateyên Çandiniyê mehane bi rêjeya ji sedî 2,49 zêde dibe, salane jî bi rêjeya ji sedî 24,43 zêde dibe. Bi vî awayî lûtkeya xwe ya dawîya 2 sal û nivî dît.
- Bankaya Zîraatê di sala 2017'an de, milkên dîger (xeyrîmenkul) ku ji kesên ji bankayê re qerzdar in bi dest xistibû 672 milyon 899 hezar bû lê di sala 2021'ê de ev hejmar 8 qat zêde bû û bû 5 milyar 375 milyon 894 hezar lîre. Tenê ji aliyê Bankaya Zîraatê ve 1.685 milkên dîger dan ber firotinê. Ev milkên dîger ji ber deynên piraniya cotkaran peyda bûye.

## Bandora hişkesaliyê didome!

- Di 28'ê tîrmehê de, li 35 bajarên li deverên cuda yê Tirkîyeyê li 138 cihên cuda şewat derketibû û 129 heb şewat hatibûn temirandin lê bi van şewatan re bi hezaran hektar daristan şewitî û gelek heywan telef bûn.
- Li gorî daneyên Gerîmendetiya Giştî ya Daristananli Tirkîyeyê di sala 2020'î de 3 hezar 299 heb şewatên daristanan çêbûye û nêzî 21 hezar hektarî erdî ziyar jê ditiye.
- Li Tirkîyeyê di 5 salên dawî de 13 hezar 592 heb şewatên daristanan çêbûye û di encama wan şewatan de 50 hezar 322 hektar erd şewitiye.
- Gava ku şewatan berdewam dikin, fiyaya balafirên ku dê di temirandina şewatan de bihata bikaranîn jî hat nîqaşkirin. Niha sê heb balafirên Tirkîyeyê yê ji bo temirandina şewatan dixebitin hene. Dema mirov qada bejahiya Tirkîyeyê hesab dike û dibîne ku ji sedî 28'ê wê daristan in, ev hejmara balafirên li gorî Yewnanistan, Fransa, Spanya, Îtalyayê pir kêr dimîne.
- Ji ber hişkesaliyê tona kayê ya ku par bi 500 lîreyî bû, bûye 1250 TL. Ji ber kêmbûna kayê di mehên zivistanê de tona kayê heta 2000 TL'yê buha bûye.
- Di 70 salên dawî de ji sedî %60'î zêdetirî erdên avî yê li Tirkîyeyê bi temamî ji dest çûn. Tenê ji ber hişkesaliya îsal li Gola Tûzê bi hezaran çelikên flamîngoyan ji ber bêaviyê telef bûn.
- Li gorî lêkolîna ku ji aliyê World Wild Fund (WWF) û perakendefiroşê Qraliyeta Yekbûyî Tesco Plc'ê hatiye kirin, nêzî 2 milyar ton xurek bêyî ku bîn xwarin tîn avêtin.

# BÎ XWARÎNÊN DEMSALÎ XWE XWEDÎ

## BÎKE



- Li gorî daneyên TUİK'ê zêdebûna buhayê salane yê mêwe û sebzeyên demsalî yê tîrmehê wiha ye: Xiyar %83, Xox %73, Gêlaz %48, Gizêr %47, Zerdelî %46, Kundir %46, Firingî %37, Fasûliyên Ter %37, Bacanên Reş %37, Mûz %31 rejeyî de zêde bûne.

- Li gorî daneyên enflasyona meha tîrmehê yê TUİK'ê zêdebûna salane ya enflasyonê ji sedî %18, 95 e û ev enflasyona tîrmehê bûye enflasyona herî bilind ya 26 meh û 18 salên dawî.

- Endeksa Buhayê Mezêxeran (TUFE) di meha tîrmehê de li gorî meha borî ji sedî 1, 80'yî de zêde bûye, Endeksa Buhayên Hilberîneran (UFE) jî li gorî meha borî ji sedî 2,46 zêde bûye.

- Li gorî daneyên TUİK'ê enflasyona xurekan mehane ji sedî %2,77 zêde bûye, salane jî ji %24,92 rêjeyî de zêde bûye. Her wiha salane enflasyona hilberîneran ji sedî %44, 92 zêde bûye.

**Buhayên Rojane yê Berhemên Demsalî**

Berhem Kg	Zeviyên Mersînê	Hala Mersînê	Manavên Mersînê	Hala Stenbolê	Manavên Stenbolê
Sêv	1,75-4,50 TL	2,75-5,50 TL	7-10 TL	3-10 TL	8-14 TL
Firingî	0,50-5 TL	1,50- 7 TL	3-11TL	2-20 TL	6-30 TL
Kundir	0,50- 1 TL	1,5- 2TL	3-7 TL	2-7 TL	8 -20TL
Pîvaz	0,25-1 TL	0,90- 1,80 TL	2,50-6,50 TL	1,5-4 TL	3-15 TL
Kartol	0,25-0,75 TL	0,50-1 TL	2-5 TL	1-5 TL	2-8 TL
Zebeş	0,25-0,75 TL	0,50-1,50 TL	2,50-3,50 TL	0 ,50-3,50 TL	2-3,50 TL
Tirî	1,5- 5 TL	2,5-7 TL	10-13 TL	6-10 TL	12-15 TL
Hêjir	7- 15 TL	9-18TL	18-25 TL	7-12 TL	16-30 TL
Barbûnya	1,50-4 TL	2,5- 5 TL	12-18 TL	5- 8 TL	15-30 TL
Bamya	4-8 TL	5 – 10 TL	20-33 TL	10-15 TL	25-35TL

•Li gorî daneyên TUİK'ê zêdebûna buhayê salane yê hin berhemên xurekan wiha ye: Rûnê Berrojkan %60, Goştê mirîşkan %56, Margarîn %56, Rûnê Garisan %51, Masî %37, Nîsk %35, Sicûq-salam-sosîs %35, Şîr %33, Hingiv %30, Hêk %28, Mast %28, Nan %26, Cureyên Penêran %24, Arvan %24, Goştê Conegayan %23 zêde bûye.